

## “Ew zarok in, ne şervan in! Zarokên Kurdistanê di bin siya desthilatdariyê de“

Şer her tim herî zêde bandorê li ser zarokan dike. Mezin bi kêmanî peyv û têgehên pêwîst hene ku tundûtûjî, tirs û windakirinê fam bikin, lê zarok li hember van serpêhatiyan bêparastin in. Şer ne tenê ewlehiya wan, belku di heman demê de zaroktiya wan jî ji wan distîne. Dom»R:9






## Piştevaniya Neteweyî ji Berxwedana Gelê Kurd li Rojava

Vexwendineke nû ji pirsa Kurd û eşkere kirina nakokiyên mafên mirovan û şerê li dijî terorîzmê di bin bandora zilhêzan de.Berxwedana gelê Kurd li Rojava, nabe tenê wekî bersivekê ji bo şerekî navxweyî an jî bertekekê li hember metirsiya li ser ewlehiyê û gefa dagîrkeran li vê beşa Kurdistanê bê dîtin. Ev berxwedan niha koregirêya siyaseta cîhanî ye, bizavek e ku valahî û bê watebûna dirûşmên xapînok yên wekî mafên mirovan, şerê li dijî terorîzmê û ........ Dom» R:4


*Bidestîveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (511) 04-02-2026*




## Kurd ji bo Kurdistanê şer dikin, ne ji bo Tehranê

Kurdistan, axek ku bi sedan salan di bin kolonyalîzma navxweyî ya Îranê de hatiye pelçiqandin, îro ji her demê bêtir ji bo serxwebûnê diqîre. Kurd ne Şah û ne jî Mela dixwazin; ew dêmokrasiyeke rastîn dixwazin, dêmokrasiyek ku tê de nasname, ziman û çarenûsa wan êdî di destê Tehranê de nebe. Ev têkoşîn ne ji bo “rizgarkirina Îranê” ye, belku ji bo rizgarkirina Kurdistanê ji destê kolonyalîzma Farsî ye. Rojhilatê Kurdistanê, bi çavkaniyên xwe yên xwezayî yên dewlemend ên wekî petrol, gaz, kangeh û av, her gav wekî koloniyeke navxweyî hatiye dîtin, ku dewlemendiya wê ji bo navenda Îranê tê veguhestin û xelkê Kurdistanê ...... Dom» R:7

# Neyarên mafê diyarîkirina çarenivîsa Kurd, kî ne?





Bi dirêjahiya xebata rizgarîxwazane a netewa Kurd de, ji xenî rêjîmên dagîrker ku bi hemî hêza xwe û bi hêz û êrîş û qirkirinê ku cehd kirine dengê azadîxwaziya miletê me mat bikin û dujminê sondxwarî bûne bo evê ku Kurd negehne maf û qedera xwe, mixabin gelek caran em şahidê vê yekê bûne ku bi pîlana nerm a dujminan, hin kes yan cereyanek li reng û bergê Kurdî de, keftine çepera dujmin û bi pirûpagende û dirûşmên xelkxapên, li hember daxwaziyên netewa Kurd de sekinîne.

Mafê çarenivîsê jî wateya wê xûya ye û ez bawerim her kes dizane ku wate, divê gelê Kurd xwe îdara xwe bike, xaka wê ji bîhaniyan anku xeyrî Kurdan paqij be, qewareyek ku xaka Kurdistanê ye diyar be, mafê netewî wek azadiya ziman û çand hebe, êdî kes li ser xaka Kurdistanê desthilatdariyê bi ser Kurdan de neke, kes û ti dagîrker û neteweyekî din, înkara hebûn û mafê Kurdan neke, bi kurtî Kurd tenê wê dixwazin ku Fars, Ereb û Turk û netewên dinê hene û bo xwe bi rewa dizanin, ewan netewan cehd kirine ku dewlet û qeware û yekdestiya welatekî qelp bi nirxa tunekirina Kurdan û dagîrkirina Kurdistanê bo xwe çê bikin, lê Kurdan tu carî çavê timahiya xaka tu neteweyekê jî nîne û tu carî jî înkara mafê tu neteweyekî dinê nekiriye.

Mafê qedera her neteweyekê jî gorî peymannamên navnetewî, Serxwebûn, Konfedralîsm, Fedratîv, Otonomî, Xwebirêveberiya kultûrî anku hemî îfadeya netewî.

Renge li heçî perçeyek ji Kurdistana perçe kirî de, gorî berçavgirtina taybetmendiyên xebatê û reftar û siyaseta rêjîmên dagîrker, yêk ji wan şiklan guncaw be bo xebatê.

Bo mînak partiyên wisa hene ku dirûşma wan ji serbixweyî yê kêmtir nîne û yê wisa jî hene ku diruşma wan xudmuxtarî anku otonomî ye, armanca herduk diruşan yek tişte ku ev jî bidestvehatina mafê Kurd e.

Di vê navberê de û bi berçavgirtina gorî rewşa niha a Îranê ku welatekî çend neteweyî ye, sîstema Fedratîv baştirîn şiklê diyarîkirina mafê çarenivîsa gelan û bi taybet bo gelê Kurd e.

Mixabin dijmin û dagîrkeran hinde kar li ser hinek alî û kesên Kurd kirin e ku hevdeng digel dujmin û dagîrker, ev jî dihola erzanfiroşiya xebat û qurbanîdan û daxwazên dikutin û îznê didne xwe ku basê dêmokratîzekirina Îranê, yan bihevrejiyana gelan û birayetiya gelan û civatgeha dêmokratîk dikin.

Ev kes û alî hevdem ku wan mijaran weke destewajên biroj û modern û birqok, xistine meydana leyîza siyasî, bi bê evê ku tenê peyvekê basê Kurd, çarenivîs û xaka Kurdistanê û şiklê diyarîkirina qedera netewî bikin.

Li wir de eyan dibe ku ev destewaje ji bilî ku ti mafekê bo Kurdan diyarî nakin, belku siyaseta nerm a dagîrkerane ku bi siyaset û devê parek ji Kurdan înkara maf û daxwaziyên neteweyî yê Kurdan bikin.

Ev yêka jî mixabin netebayî û ducergetiyê dixe nava gel û nahêle yêkdenî û yêkrêzî û yêkgotarî di nava gel û hêz û aliyên Kurdistanî de çê bibe.

Ezmûn û desthilata 2 ji perçên Kurdistanê her tiştî weke eynîkekê dixe ber çavên me, ku li yêk ji wan de kiyanek çêbûye hemî cîhan wek dewletek îfade dike, û ya din jî mixabin şerê welatîbûna di nava rêjîmekî dagîrker de dike.




## Daxuyaniya Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê (PDKÎ) li derheq biryara Yekîtiya Ewropayê bona bi terorîst nasandina Sipaha Pasdaran a rêjîma îranê

Dom » R:2



## Li Rojavayê Kurdistanê yekrêzî û têkoşîna gelê kurd û xebatên dîplomasîyê dê rêya azadîyê xurtir bike

Dom » R:5

## Daxuyaniya Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê (PDKÎ) li derheq biryara Yekîtiya Ewropayê bona bi terorîst nasandina Sipaha Pasdaran a rêjîma îranê

Yekîtiya Ewropayê piştî çend salan nîqaş û nirxandin li ser bi terorîst nasandina Sipaha Pasdaran, di dawiyê de roja Pêncşemê 9ê Rêbendanê, wezîrên derve yên vê yekîtiyê biryar dan ku Sipaha Pasdaran bixin nav lîsteya rêxistinên terorîstî de.

diyar e ku berê jî welatên Amerîka, Kanada, Ustralya, Lîtwanî, Ekwador û Paraguay jî, Sipaha Pasdaran bi tewawî xistibûne nava lîsteya rêxistinên terorîst de, herwisa Erebistan, Behrêyn û Arjantînê jî Sipaha Quds, baska leşkerî ya derveyî ya Sipaha Pasdaran, xistibûne nava lîsteya terorê de.

Ev biryara Yekîtiya Ewropayê, ku helwêst û biryara 27 welatên endam ên nava Yekîtiya Ewropayê de ye, wekî bertek li derheq tepeserkirina bi xwîn a serhildana xelkê Îranê di nerazîbûnên meha Befranbarê deye ku bi hezaran xwenîşanderên nerazî bi çekan hatine kuştin û jiyana wan ji wan hat standin.

**Sipaha Pasdaran, ku piştî demeke kurt ji serkeftina şoreşa gelên Îranê di sala 57'an de bi fermana Xumeynî ji bo parastina şoreşa Îslamî hate damezrandin, bi dirêjahiya 47 salên desthilatdariya rejîmê de di tepeserkirina hemû nerazîbûn û xwenîşandanên navxweyî yên Îranê de rolek sereke lîstiye, herwisa li derveyî welat jî sedan kes ji dijberên siyasî yên rejîmê teror kirine.**

Sipaha Pasdaran yek ji wan hêzên sereke bû ku piştî fetwa û fermana Xumeynî êrîşî Kurdistanê kir û sedan trajedî, komkujî û hezaran cinayet û tawan li Kurdistanê afirandin.

Newroza xwînîn a Sineyê di sala 58'an de, êrîş û dorpêça 24 rojan a bajarê Sineyê, kuştin û birîndarkirina hezaran kesan ji xelkê wî bajarî, her wiha qirkirin




û komkujî li gundên Qarne û Qelatan û şewitandin û kawilkirina dehan gund û deverên din û koçberkirina xelkê din ên Kurdistanê, tenê beşek ji karnameya terorîstî ya Sipaha Pasdaran li Kurdistanê di salên destpêkî yên damezrandina wê rêxistinê ye.

Di dirêjahiya 47 salên çalakiyên Sipaha Pasdaran de, para herî mezin ji terorîzma dewletî ya Komara Îslamî ya Îranê û Sipaha Pasdaran ber Kurd û tevgera Kurdî keftiye, di nav tevgera Kurdî de jî bi taybetî Hizba Dêmokrat.

Hîzba Dêmokrat û tevgera Kurdî 47 sal in li xeta pêşîn a şerê li dijî vê rêxistina terorîstî de ne.

**Sipaha Pasdaran bi biryara berpirsên herî serve yên Komara Îslamî, li Viyenê li ser maseya gotûbêjê Dr. Ebdulrehiman Qasimlo, sikirtêrê giştî yê vê hîzbê, û herwisa li Berlîna Almanê, di restorana Mîkonosê de, Dr. Sadiq Şerefkendî, sikirtêrê giştî yê vê hîzbê, digel endamên şanda hîzba Dêmokrat, teror kirin.**

Cinayetên Sipaha Pasdaran tenê bi tepeserkirina xelkê navxweyî yê Îranê re sînordar nabe, belkû li derveyî sînorên welat jî bi rêya Sipaha Quds û bi damezrandin û piştîvanîkirina gelek rêxistinên din wek Hizbullaha Lubnanê, û bi desttêwerdan di karûbarên navxweyî yên welatên herêmê de, rasterast di kuştina sedan hezar kesan de berpirsiyar e û bûye sedema koçberbûn û derbederbûna milyonan kesan ji welatên wan.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, tevî pêşwazîkirin ji biryara Yekîtiya Ewropayê, bona bi terorîst nasandina Sipaha Pasdaran, di wê baweriyê de ye ku ev biryar herçiqas dereng jî hatibe danê, biryarekî rast û bi cî ye.




Divê em ber bi rojên ku hemû ew kesên ku fermandar û encamdarên sereke yên kuştin û komkujîya xelkê bêdesthilat û bêberevan ê Kurdistan û Îran û welatên herêmê bûne biçîn û divê ev kes li dadgehên navxweyî û navneteweyî de li gorî cinayetên xwe bigihîjin sizayê cezayên xwe.

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
**Desteya Karêgerî**
**10'ê Rêbendanê 1404**

# Plînoma 6ê ya Kumîteya Navendî: Komara îslamî zêdetir ji her demekê li kendalê herifênê nêzîktir bûye

**(Daxuyaniya birêveçona 6 mîn plînoma Kumîteya Navendî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê)**

Kumîteya Navendî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li roja Duşemî 19ê Kanûna duyem a 2026 an, 6 mîn plînoma xwe bi rê ve bir.

Plînoma 6ê a Kumîteya Navendî ya hilbijartiya Kongireya Yekgirtina Dêmokratan ku bi beşdariya endamên eslî û cihgirên Kumîteya Navenmdî bi rê ve ço, rewşa niha ya Îranê a piştî serhildana befranbara îsal, rewşa Opozîsyona komara îslamî û derfet û gefên li ser rêya tevgera Kurd û herwisa çend mijarên navxweyî û rêkxiraveyî yên Hizbê hilsengandin û biryarên hewce li ser hejmarek erk û projeyên Hizbî dann.

Plînoma 6ê ya Kumîteya Navnedî bi bistek bêdengî bo rêzgirtin ji yad û xebata Şehîdên Kurdistanê bi taybet şehîdên vê dawiyê li êrîşên hêzên kirêgirtiye rêjîmê de bo ser xwenîşanderên Îranê bi taybet deverê nişîv ên Kurdistanê li Kirmaşan û Îlamê dest bi karê xwe kir.

li beşa yekem a karê plînomê de rêzdar Mistefa Hicrî, Sikirtêrê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li berhevdanekî hûr a siyasî û hemûaliyane li ser rewşa giştî ya Îranê piştî pêla nû ya nerizayetiyên vê dawiyê yên dijî komra îslamî, rewşa opozîsiyonê û erkên ser milê tevgera siyasî-netewiya Kurd bi taybet Hizba Dêmokrat kir.

Beşdarên pilînomê jî ra û dîtingehên xwe li ser berhevdana Sikirtêrê Giştî yê Hizba Dêmokrat dane xuya û bi wî awayî, encam ji basên pilînomê hate girtin.

Plînoma Kumîteya Navendî li ser vê baweriyê bû ku nerizayetiyên vê dawiyê li Îran û Kurdistanê de bi tenê bo nîşandana nerizayetî li derheq rewşa aborî, bêkarî, bilindbûna nirxan û bênirxbûna dirafê Îranê û ji vê nêrînê ve, daketina zêdetir a roj bi roj a şiyana kirîn a xelkê nebû, belku hevdem berhema hişyarî û têgihîştina siyasî ya xelkê û serhildan bi dijî rêjîma siyasî ya dîktator û mirovkuj e ku jiyan û maf û azadiyên wan zewt kirine û bersiva her cure daxwaz û mafxwaziyeke xelkê bi agir û tepeserkirina bi xwîn dide.

Lewma demek durûşma "Biherife dîktator" hate bilindkirin, bi fermanan




Xamineyî, mezintirîn kuştara xelkê ser şeqaman hate kirin.

Plînoma Kumîteya Navendî tevî hevxemî digel malbatên wan hezaran kesî ku li vî heyamî de li pêvajoya nerizayetiyan de bi teqeya rasreterast a hêzên rêjîmê şehîd bûn an li girtîgehan de canê wan ji wan hatiye standin, pêdegirî li ser vê yekê kir ku xwînbihaya wan şehîdan û nirxdana giran a vê serhildanê ev e ku komara îslamî zêdetir ji caran bi kendalê herifînê nêzîk bûye.

Plînoma Kumîteya Navendî bi bilindnirxandina cangorîkirina xelkê Kirmaşan, Îlam û Melekşayê li wan nerizayetiyan de mangirtina roja 18ê Befranbarê li Kurdistanê bo piştevanîkirina xelkê Kurdistanê li welatiyên deverên nişîv ên Kurdistanê, piştevanî li bilindkirina dengê hatî bilindkirin ê xelkê deverên din ên Îranê û şermezarkirina tundûtîjiya komara îslamî bi bilind ragirt û ragihand ku ev mangirtin careke din jî pêgeha bilind a siyasî û rêkxistinkirî ya tevgera Kurd li Îranê de da nîşandan û bawerî û hitbareke zêdetir bo Kurd li hevkêşên paşeroja Îranê de bi dest xist.

Plînoma Kumîteya Navendî li beşeke din a mijarê de îşare bi nerizayetioyên vê dawiyê li Îranê û siyasetên komara îslamî wek qutkirina hemû hêlên pêwendîgirtinên navxweyî Îranê bo derveyî Îranê, tepeserkirina bi xwîn a xelkê û vekirina pêşangeha termên kuştiyan helwêsta Amerîka û Ewropayê li hember komara îslamî bi hev nêzîktir kiriye; li ser vê baweriyê bû eva ku heta niha jî komara îslamî ragirtiye tenê alav û hêza tepeserkirin û nebûna alternativek bo vê rêjîmê ye.

Plînom li ser vê baweriyê bû ku hewldana hemûalî ya dijberên komara îslamî herî kêm, bo gihîştin û lihevkirin û xirîserhevkirina hêzên wan bo derbasbûn ji komara îslamî, hewcehiyeke gelek hestiyar e.

her li vê çarçoveyê de jî bihevnêzîkbûna zêdetir a hêzên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê û hebûna berhema kar û projeyên Navenda Diyalog bo Hevkarî a Hizbên siyasî yên Kurdistana Îranê bi bilind nirxand.

Plînom li beşeke din a basên xwe de bi balkêşandin bi ser bûyerên vê heyamî li Sûriye û Rojavayê Kurdistanê û berfirehbûna şer û dijheviyan, li ser vê baweriyê bû ku eva li vê heyamê de li bajarê Heleb û cihên din ên wî welatî de bi dijî Kurdan li Rojavayê Kurdistanê de diqewime, li berdewamiya wan şerane ye ku li salên berê de jî berdewam bo ser Kurdan hatiye kirin û armanca wan dîsan pêdagirî li ser siyaseta pêştir a rêjîmên berê ye ku bersiva her mafxwaziyeke Kurdên wî welatî bi qirkirin û guherîna dêmografî û pêkhateya rûniştiyên vê deverê daye.

Plînom pêdegirî li ser vê yekê kiriye ku bi komkujî û qirkirina netewî, dijheviyên siyasî nayêne çareserkirin û netewa Kurd jî ku bi dirêjahiya dîrokê bo mafên xwe yên rewa xwîn û nirx daye û canê xwe fida dike, ji xebata bo bidsestveanîna mafên xwe, sar û sist nabe.

Lewma îtirafkirin bi vekhevî û mafên rewaye Kurd û hemû pêkhateyên wî welatî û hewldan bo çareserkirina dijheviyan bi rêya diyalog, çareseriya rastîn a vê rewşê ye.

Herwisa pêşdestiya aliyên navnetewî û bandora wan pêka berpirsayetiya siyasî û exlaqiya wan, dikare hander û alîkarderek girîng be bo dawîanîn bi vê rewşê.

Li beşên din de destûra karê 6 mîn plînoma Kumîteya Navendî, çawatiya aktîvkirina beşên curbicur ên organîzma Hizbî ya pêywendîdar bi rewşa niha ya Îran û Kurdistanê li pêxema amadehiya zêdetir a Hizbê bo rûberûbûn û rolhebûna zêdetir li pêşhatên siyasî li paşerojê bû ku piştî vergirtina ra û dîtingeha beşdarbûyan, pêspartî û biryara hewce bi ser hate dan.

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
**Kumîteya Navendî**
**20ê Kanûna duyem a 2026 an**

# Piştevaniya Neteweyî ji Berxwedana Gelê Kurd li Rojava



N. Serbest Urmiye



Vexwendineke nû ji pirsa Kurd û eşkere kirina nakokiyên mafên mirovan û şerê li dijî terorîzmê di bin bandora zilhêzan de.
Berxwedana gelê Kurd li Rojava, nabe tenê wekî bersivekê ji bo şerekî navxweyî an jî bertekekê li hember metirsiya li ser ewlehiyê û gefa dagîrkeran li vê beşa Kurdistanê bê dîtin.

Ev berxwedan niha koregirêya siyaseta cîhanî ye, bizavek e ku valahî û bê watebûna dirûşmên xapînok yên wekî mafên mirovan, şerê li dijî terorîzmê û evlekirina herêmê di bin siya berjewendiyên zilhêzan de dide selimandin.

Piştevaniya neteweyî û yekrengiya gelê Kurd ji vê berxwedanê, nabe tenê wekî hest û soza neteweperwerî ya demkî bê hesibandin, belkû hewildaneke bi zanebûn e ji bo vexwendineke nû ya cîhanî ji pirsa Kurd, û dengvenaeke li hember bêhitbarbûna pêkhate û pergala navneteweyî.

**Pirsa Kurd, Ji xewlebûna dîrokî ve heta navendên nakok ên cîhanî**
Bi salan e ku pirsa Kurd bûye goriyê lihevhatinên veşartî, sînorên zordestî û siyaseta bi her bihayekê evlekirina rewşa herêmekê ku navenda hevrikiya hevkêşeyên dijber ên cîhanî ye.

Ev berxwedana vê carê ya Rojavayê Kurdistanê, rakişandina vê pirsê ye bo navenda siyaseta cîhanî. Gelê Kurd di yek ji hestiyartirîn û girîngtirîn qonaxên herêmê de, roleke pir girîng dît.

Rolek ku heya dijmin jî neçar kir ku serê xwe li ber bitewînin. Di demekê de ku pirsgirêka DAIŞê cîhan bi ser du eniyên berjewendîparêz û parêzvanên lawaz de dabeş kiribû, gelê Kurd weke hêzeke sereke karî maziye pişta vî dêhwê ku zilhêzên cîhanê jê ditirsiyan, bişkêne.

Lê ew serkevtina mezin, li şûna ku bibe bingeha pênaseya siyasî û yasayî, bû emrazek ji bo bikaranînê di lîstikên di navbera hêzan de.

Kurd bû hevparê meydanî, ne hevparê siyasî û sitratejî bûn. Di vir de ye ku piştevaniya neteweyî ya Kurdistanê ji Rojavayê Kurdistanê, wateya rasteqîne werdigire: Şer ji bo hilweşandina wê forma bi emrazkirina gelê Kurd û di hember de sepandina pirsa Kurd weke hebûneke yasayî û siyasî ku êdî nehê bêdeng kirin.

**Mafên Mirovan, pêwereke cîhanî, yan emraza siyasetê?**
Hêzên mezin careke din dane xuyakirin ku mafên mirovan li cem wan ne prensîb e, belkû parsengek e ku bi berjewendiyên wan ve hatiye helawîstin.

Dema hêza Kurd DAIŞê têkşikandin, weke hêzeke herêmî ya bi bandor hatin pênasekirin, lê dema ku daxwaza xwebirêveberî, ewlehî û rûmeta xwe ya mirovî dikin, heman hêza bi bandor ji aliyê hin dewletan ve di weke gef li ser ewlehiyê tê nasandin û ber bi rûyê bêdengiya hêzên bi nav parêzvanên mafên mirovan dibin.

Piştevaniya gel ji berxwedana Rojavayê Kurdistanê, ev rastiya aşkera kir: Heke şerê li dijî terorîzmê rast û rewa ye, lê çima hêza ku herî zêde qurbanî di vê rêyê de da, niha gorî peymanên siyasî tê piştguhxistin? Û heke mafên mirovan pêwereke yasayî ya cîhanî ye, çima bombebaran, koçberkirina zordestî û tepeserî û êrîşa li ser Kurdan li Rojavayê Kurdistanê û Sûriyê, heta niha weke krîzeke cidî nehatiye dîtin û jê nehatiye pirsîn?

**Rûbirûbûna digel Terorîzmê, sepandina hêzê ye, ne nîşan û berjenga rastiyê**
Yek ji aliyên herî metirsîdar ên siyaseta cîhanî, teşqelî û pênasekirina emraziye ji têgeha terorîzmê û guhertina wateyên wê li gorî berjewendiyan e.

Di vê qumarê de, çê dibe ku komek ku heya duh hevalbendên xwedî bandor bûn, îro weke gefeke mezin bo ser ewlehiya neteweyî were pênasekirin.

Xebata gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê, rast di nav vê teşqelî û fêlbaziya siyasetê de derbas dibe, ev ne tenê di çeperên pêşî yên şerê li dijî terorê de bûn, belkû bûne qurbaniyên wan pênaseyên siyasî yên nû ku hêzên mezin li gorî berjewendiyên xwe tîne ziman.

Xwedî derketina neteweyî û nîştimanî li Rojavayê Kurdistanê, vê lîstika metirsîdar rûbirûyî vê pirsê dike: Gelo kê ye ku ev rewayetî heye ku biryarê bide ka terorîst kî ne? Gelo danezanîna terorîstan girêdayî kiryar, îdeolojî û tundûtûjiyê ye, yan tenê di asta serîçemandinê de ye li hember daxwazên jeopolîtîk ên zilhêzan de?

**Berpirsyariyeke Dîrokî, Bilindtir ji hevxemiyê**
Heke ev piştgiriya ku li Rojava'yê Kurdistanê tê kirin, tenê di forma meş, daxuyaniyan û hevxemiyê de bimîne, ji bilî ku ji bihayê vê kêm dike, tu guhertinan jî li şun xwe de naîne.

Girîngiya piştevaniya nîştimanî ya Kurdistanê di kêrhatibûna wê de ye ku dikare bibe gotareke siyasî ya hevgirtî. Gotarek ku dikare pirsa Kurd ne wekî krîzeke ewlehiyê, belkû weke pirseke çaresernekirî ya demokrasî û mafên neteweyan bi ser cîhanê bide sepandin.

Di rastî û di dawiyê de, berxwedana gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê, neynûkek e li pêşberî rastiyên pergala cîhanî ku xêliya mafên mirovan û rûbirûbûn bi terorîzmê re li ser rûmetê sîstema cîhanî radike û eşkere dike ku berjewendî qisa yekem dike.

Piştevaniya neteweyî ya Kurdistanê, heke hişmendane, rexnegir û serbixwe bidome, dikare ne tenê hêzên cîhanî, belkû hêzên Kurdî jî rûbirûyî vê rastiyê bike: Gelo em amade ne ku pirsa xwe ji cixiza mezlûmiyetê derxin û derbasî asta bilind a daxwazên siyasî û neteweyî bikin?

# Li Rojavayê Kurdistanê yekrêzî û têkoşîna gelê kurd û xebatên dîplomasîyê dê rêya azadîyê xurtir bike



**N. Mustafa Ozçelîk:**
**Serokê Giştî yê (PWK)**

Ji bo çareserîya mayînde, pêwîstî bi têkoşîn û xebateke berfireh û dûr û dirêj heye. Lê belê, îro, pêwîstîya acîl ya sereke ewe ku, agirbesta di navbeyana Rêvebirîya Şamê û HSDyê de berdewam bike û alîkarîya mirovî bigihêje gelê me yê Rojavayê Kurdistanê.
Di helwest û sîyaseta Rêvebirîya Şamê û Amerîkayê de guhertinên balkêş rûdidin.
Rêvebirîya Şamê ya ku heta 15 roj berê jî Rêvebirîya Xweser wek fermî nas dikir, nuha helwesta xwe guhertîye.
Nuha Rêvebirîya Şamê bi hişmendîya ''Cimhûrîyeta Îslamî ya Erebî ya Sûrîyeyê'' dixwaze li ser esasê ''îslamî', 'şowenîzma erebî, sîstemeke takekesî, unîter, totaliter, ku mafê statuya kurdan, mafên durzî, elewî, xirîstîyan, êzîdî û hemû gelan, tune bike.

Aşkere ye ku di vê helwesta Rêvebirîya Sûrîyeyê de li gel sîyaseta îdeolojîk û şowen ya Rêvebirîya Sûrîyeyê, tesîra sîyaseta Dewleta Tirkîyeyê jî bandoreke xwe ya mezin heye.

Rêvebirîya Sûrîyeyê li serî de bi organîzatorî û alîkarîya Dewleta Tirkîyeyê, êrîş bir ser taxên Şêx Meqsûd û Eşrefîyeyê yên Helebê ku piranîya niştecîhên wê kurd in. Li herdu taxên kurdan ên Helebê, hêzeke biçûk ya asayîşa kurdan hebû. Hêzên asayîşa kurdan ya li herdu taxên Helebê biryara berxwedanê dan û di encamê de bi şehadeta bi sedan şervanên kurd û kurdên sivîl, bi koçberîya 200 hezar kurdên herdu taxan û bi şikesteke berbiçav, kurdan zerararek mezin dîtin û rê ji Rêvebirîya Sûrîyeyê re xweştir kir ku êrîşên xwe berfirehtir berdewam bike.

Belê, li gel van hemû rîskên ku li ber derîyê gelê me ne û li gel van hemû pêşhateyên neyênî yên vê dawîyê jî têkoşîna meşrû ya ji bo mafên neteweyî, demokratîk, ji bo azadîya Rojavayê Kurdistanê berdewam e û dê li gel hemû zehmetîyan jî berdewam bike.

Ez di wê bawerîyê de me ku di encama van xebatên navneteweyî, yekrêzîya nav mala kurd de, li herêmên kurdî yên Rojavayê Kurdistanê ku nuha di îdareya kurdan de ye, dê şans û îhtîmala pêkanîna statu û birêveberîyek siyasî û kulturî û asayîşa navxweyî di destê kurdan de xurtir bike.

Di vî warî de, dîroka nêzîk ya kurdan xwedîyê nimûneyên zindî û balkêş in. Di sala 2014an de Emerîkayê li gel Rêzdar Serok Mesûd Barzanî dixwest ku bi "Mitabaqata Dihokê" yekrêzîya sîyasî, îdarî, leşkerî, aborî, dîplomasî ya gelê me yê Rojavayê Kurdistanê pêk bînin. Lê mixabin, bêtir, hêza desthilat, ango Rêvebirîya Xweser, HSD, PYD, YPGyê biryarên Mitabaqata Dihokê û Konferansa Qamişloyê bi cîh neanîn.

Ji ber vê rastîyê, em gunehê vî dîmenê ku îro dilê me diêşîne bes nexin stûyê Amerîkayê. Aliyên siyasî û berpirsyar ên Kurd li Rojavayê Kurdistanê xetabarin ku heya niha nekarîne yêkrêz bin.
Ez di wê bawerîyê de me ku pêkanîna biryarên Konferansa Qamişloyê, yekrêziya di nav hemû kurdên cîhanê de û lêxwedîderketina Rêzdar Mesûd Barzanî û rêvebirîya Başûrê Kurdistanê û hemû alîyên sîyasî yên Başûrê Kurdistanê, dê li cîhanê dostên me zêdetir, dijminên me kêmtir bike, dê rê li ber şikestinek mezin bigre û rêya serkeftinê xurtir bike.

Werin em sala 2003yê, dema hilweşîna Rejîma Saddam Huseyîn bînin bîra xwe. Piştî rûxandina Rejîma Saddam Huseyîn, Paul Bremer wekî Serokê Rêveberîya Koalîsyona Demkî (CPA) û rayedarê herî bilind yê Amerîkayê li Iraqê hatibû erkdarkirin.

Paul Bremer di dema amadekirina Destûra Nû ya Iraqê de weha gotibû: "Em germ li dabeşbûna Iraqê ya li ser bingeha etnîkî an jî mezhebî (federasyon) nanêrin. Vîzyona me rêveberîyeke herêmî ya li ser bingeha parêzgehan e ku erkên wan kêm bin. Divê dawî li hebûna Herêma Federal ya Kurdistanê bê anîn. Her wiha, em dixwazin hemû hêzên milîs (Pêşmerge jî tê de) bêne bêçekkirin, werin belavkirin û tevlî jîyana sivîl bibin.".
Li hemberî vê helwesta Paul Bremer, Rêzdar Mesûd Barzanî jî bersiveke wiha dabûyê: "Rêveberîya federal ya ku em ji sala 1991ê ve bi pratîkî dimeşînin, berhema têkoşîna sed salî ya gelê Kurdistanê ye, mafekî rewa û neteweyî ye.

Neteweyên cîhanê xwedî çi mafan bin, neteweya Kurd jî xwedîyê heman mafan e. Ji ber vê yekê, divê Herêma Federal a Kurdistanê di Destûra Iraqê de bi fermî cîh bigre. Her wiha, hêza Pêşmerge ya Kurdistanê ne 'hêzeke milîs' e; hêzeke neteweyî ye ku ji bo azadiya gelê Kurdistanê têkoşîyaye û îro jî Kurdistanê diparêze. Divê Hêza Pêşmerge wekî hêza parastinê ya Herêma Kurdistanê û wekî parçeyek ji artêşa Iraqê were qebûlkirin."



Rêzdar Celal Talabanî û hemû partîyên kurdan jî piştgirî dan vê helwesta Rêzdar Mesûd Barzanî.Paul Bremer di destpêkê de helwesteke pir hişk danî û got ku ew paşde gav navêjin.
Mesûd Barzanî jî got: "Em mafên xwe yên rewa diparêzin. Lê heger hûn bi israr bixwazin mafên me yên federal û hêza me ya pêşmerge belav bikin; kerem bikin, heger hêza we têrê dike werin rêveberîya me û pêşmergeyên me belav bikin".

Li hemberî vê helwesta kak Mesûd, bi fermana Serkomarê vê demê ê Amerîka Corc Bûşê kur, Paul Bremer neçar ma ku vê helwesta xwe biguhere. Bi vî awayî daxwazên kurdan, ango Herêma Federal ya Kurdistanê û Hêza Pêşmerge, bi fermî di Destûra Bingehîn ya Iraqa Federal de cîh girtin.

Îro, Serokê DYA Donald Trump, Thomas Barrack wekî Nûnerê Taybet ê Sûriyeyê erkdar kirîye, hevdîtinên navbera rêveberîya nû ya Sûrîyeyê û Rêveberîya Xweser a li Rojavayê Kurdistanê de, helwesteke ku maf û azadîyên kurdan tune dihesibîne nîşan da.
Thomas Barrack jî got ku "Hevpeymanîya me û HSDyê li dijî DAIŞê hebû. Niha pêwîstîya vê nemaye. Bila endamên HSDyê yek bi yek tevlî artêşa Sûriyeyê bibin. Divê yekparçeyîya axa Sûriyeyê were parastin. Divê herêmên otonom nemînin. Divê mafên kurdan û hemû pêkhateyên li Sûriyeyê wekî hemwelatîyên wekhev di Destûra Sûriyeyê de cîh bigrin."

Ev helwesta Thomas Barrack ya ku bi awakî eşkere dixwaze hêzên leşkerî yên kurdan werin belavkirin û statuyeke siyasî nede Rojavayê Kurdistanê, pir dişibe helwesta Paul Bremer ya sala 2003yê.
Li Rojavayê Kurdistanê têkoşîna milî, demokratîk ya ji bo azadîyê dê berdewam bike,Di vê rewşê de, îhtîmal heye Amerîka heta radeyekê piştgirîyê bide parastina destkeftiyên heyî û herweha piştgirîyê bide mafen neteweyî, demokratîk û kulturê yên kurdan ku di Qanûna Bingehîn ya Sûrîyêyê de ku di pêşerojê de bê amade kirin de cih bigre. Ango DYA, her çend çarçoveya Konferansa Qamişloyê bi her awayî bi cîh neyne jî mimkun e ku li herêmên ku nuha di destê kurdan de ne piştgirîyê bide statuyeke leşkerî, siyasî, kulturî, îdarî û aborî ya kurdan.
Di rojên pêş de, sîyaseta Amerîka û Îsraîlê ya li hemberî Îranê, rewşa şerê Rûsya û Ukraynayê, rewşa Filîstînê, berjewendîyên Îsraîlê yên li Sûrîyeyê, dê tesîreke mezin li ser rewşa Sûrîye û Rojavayê Kurdistanê bike. Ango li gorî van pêşhateyên ku me behs kirin, berjewendîyên dewletan û balansa hêzan ya di navbeyna dewletan de dê faktorên tayînker bin.
Heger xuşk û birayên me yên li Rojavayê Kurdistanê, ji zerarên ku ji ber pekneanîna biryar û armancên Mitabaqata Dihokê û Konferansa Qamişloyê rûdane bikaribin dersan derxînin, ez bawer im ku em dê ji niha û pêve bikaribin siyasetek bêtir realîst û neteweyî, bi hevrêzî û helwestek hevbeş tevbigerin. Helwestek hevbeş û yekrêzîya di nav mala kurd de, dê tesîreke mezin li sîyaseta Emerîka, Fransa, Îngîltere, Îsraîl û dewletên din ên li herêmê xwedî rol in bike.
Ji ber wê jî, ji bo rê li ber girtina êrîş û qetlîamên li ser gelê me yê Rojavayê Kurdistanê, ji bo lêxwedîderketina mafên neteweyî, demokratîîk, ji bo bi hev re ava kirina nexşerêyeke nû; ez di wê bawerîyê de me ku civîneke hevbeş bi beşdarîya aliyên Kurdî hewceye û tenê yekîtî dikare zaminê mafê gelê me be .
Herweha em dibejin, îro di navbera her çar perçeyên Kurdistanê û kurdên dîasporayê de demildest ava kirina koordînasyon û helwesteke yekgirtî ya neteweyî, niştimanî pêwîstîyeke esasî ye. Ez bawer im ku di demekê de ku li çar alîyê Kurdistanê û cîhanê de dilê hemû kurdan bi slogana ''Yek e, yek e, yek e, gelê kurd yek e'', bi hev re lê dide, wek yek miletî bi hev re tevdigerin, zemîna vê koordînasyonê ji her demê zêdetir xurtir bûye.

# Zaroka al hilgir: Dengê Kurdistanê



N. Hesen Mukerem

Di nav aloziya siyasetê û hîleyên desthilatdariyê de, carna wêneyek ji hezar peyvan watedartir e.
Wêneyekî zarokeke Kurd, hîn jî bi memikmija di devê xwe de, lê bi çavên xwe yên bêwestan, ala neteweya xwe hembêz dike, bêyî ku tiştekê li ser nijad, sînor an peymanan bizanibe.
Destên wî yên piçûk hilgurê sirrek mezin in, sirrek bi navê hest û wijdana neteweyî.
Wî hîn cîhan ne kiriye du reng, qencî û xerabî, û ji berjewendî û sozên rêberan bêagah e, lê di qata herî kûr a canê xwe de dizane ku ev qumaşê sêreng ji sembolekê bêtir e.
Ev al neynikeke bîra kolektîf a neteweyekê ye, bîranîneke dengê dayikên çiyayî, porê kal mêrên dûrxistî û axa ku bi xwîna şehîdên ku di dilê dîrokê de bêhna xwe dane, aram bûye.
Dema zarokek Kurd ala xwe bilind dike, ew di rastiyê de ji jiyan û canê xwe - bêyî ku pirtûkek xwendibe - gazî mîrateya berxwedana hezar salî dike.
Ji bo wî, al ne tenê rengek e, ew henase ye. Ew nizane siyaset çi ye, lê dizane ku jiyana bê nasname mirina di bêdengiyê de ye.
Ev metirsiya ku rejîmên zordar jê ditirsin: mezinbûna bêdeng lê bêhempa ya hişmendiya neteweyî ye, mezinbûnek ku di nav nifşan de di bin hişmendiyê de dirêj dibe. Çek dirizin, hikûmet hildiweşin, û elît tûşî jibîrkirinê dibin, lê heke tovê hişmendiyê di dilê zarokekê de were çandin, tu agirekê şiyana şewtandina wê tune ye.

Zordar hewl didin ku bîra neteweyekê jê bibin, ew zimanekê qedexe dikin, dîrokê çewt dinivîsin û nşanan dişewitînin.
Lê di cih de ku zarokek ala xwe li kolanan bilind dike, tevahiya siyaseta jibîrkirinê hilweşe.
Ew wêne peyamek zelal dihewîne: "Em hîn jî sax in, ne ji ber ku em behsa dîrokê dikin, lê ji ber ku em bi baweriyê dijîn."

**Hest û îradeya gelê Kurd keleha dawî ya berxwedanê ye, kelehek ku ne bi dîwaran lê bi hestan hatiye avakirin.**

Ev hest û îrade ne mîratek e ku ji pirtûkekê mîrat hatibe vergirtin, beklû peşiqela agir e ku ji singa dayikê derbasî rihê zarokekê dibe, dayikek ku lorika wê ji azadiyê re distirê, zarokek ku di xewnên xwe de rengê axa rengîn a Kurdistanê dibîne, û zilamek pîr ku hîn jî navê Kurdistanê bi kopalê xwe yê kevin li ser axê dinivîse.

Li hember neteweyek wisa, têkçûn bêwate ye, netewe dema ku ji bîr dikin têk diçin, ne dema ku zarokên wan ala wan berî ku bigihîjin mezinbûnê nas dikin.
Zarokê ku ala xwe di nav dengê cîhanê de bilind dike û dihejîne, ne tenê dilîze, ew leşkerê herî bê çek e di artêşeke bêdeng de, artêşek ku bi evîn û hişmendî şer dike.

Ev heman serhildana bêdeng e, lê pîroz e ku rêberek tune û tirsê nas nake, serhildanek ku di zikê dayikên Kurdistanê de dest pê dike û ji her sînorî wêdetir diçe.
Dikarin dev dabixin, lê dil nayên jikarxistin. Dikarin pirtûkan bişewtînin, lê nikarin hest û îradeya zarokên neteweyekê jinav bibin..

Zaroka Kurd ku alê bilind dike dibêje: "Min ji bîr nekiriye." Û her nifşek ku wî dibîne dîsa şiyar dibe, Ji ber ku Kurdistan ji hestê jidayîk dibe, û hest jidayîkbûna evîna azadiyê ye.



Zaroka ku ala Kurdistanê hildigire ne tenê dilîze, ew berdewamiya dîrokekê ye ku dagîrkerên Kurdistanê hewl dane wê jinav bibin, lê bi ser neketin.

Ev wêne vê yekê tîne bîra me ku heta ku al di destên zarokan de bilind û hildayî û zindî be, tu hêz nikare îrade û hesta neteweyekê bişkêne û wê netewê bêdeng bike.

# Daxuyaniya Kongireya Netewên Îrana Federal li derheq bi terorîstnaskirina spaha pasdaran ji aliyê Yekîtiya Ewropa ve

Kongireya Netewên Îrana Federal pêşewazî li biryuara Yekîtiya Ewropayê bo tomarkirina spaha pasdaran li lîstê rêkxiravên terorîstî de kir û ev biryar bi pêngawek girîng û hewce bo bihêzkirina bersivdana navnetewî, piştevanîkirin li mafê mirov û rawestan li hember terorîsma hikûmî binav kir. Ev biryar ku nîşanderê îradeya siyasî ya hevpar a welatên endam ên Yekîtiya Ewropayê ye, bersivek bi wec bo karnameya bi belge ya vê damzraveyê li warê binpêkirina berfireh û rêkxistinkirî ya mafên mirovî û kiryarên terorîstî li navxwe û derveyî Îranê tê hisêb.
Spaha pasdaran a rêjîma Îranê, damezraveyek e ku piştî sala 1357 a Rojî, bi armanca parastina desthilata rêjîma Îslamî hate avakirin, li dehikên derbasbûyî de bi yek ji bingehên bikaranîna tundûtîjiya sîstimatîk, tepeserkirina nerizayetiyên aşitîxwazane û sînordarkirina sîstematîk a maf û azadiyên bingehîn ên xelkê ye. Bandora berfireh a vê damezraweyê li sîstema siyasî, ewlehî û abûriya Îranê, rêxweşkerê binpêkirina berdewam a xalên bingehîn yên mafê mirovî û desthilata yasayê bûye.
Rola rasterast a spaha pasdaran li tepeserkirina serhildanan û nerizayetiyên xelkê ên wek tevgera "Jin Jiyan Azadî" û nerizayetiyên din ên seranserî de bikaranaîna zêde a zorê, teqekirin li nerazîyan, binçavkirinên berfireh, îşkence û kuştina xelkê medenî de, bi awayekî berfireh bi belge hatiye tomarkirin û bala navendên navnetewî û raya giştî ya cîhanê bo aliyê xwe rakêşaye. Li vê çarçoveyê de gelên jêr sitem li Îranê de zêdetirîn derb û nirx dane.
Li deverên wek "Kurdistan, Belûçistan, Ehwaz, Tirkemen sehra û Azerbaycanê, kiryarên spaha pasdaran ên wek kiryarên serbazî yên berfireh, tepeserkirina tundûtîj a nerizayetiyan, bidarvekirinên derveyê yasayê, kawilkirina gundan, awarekirina bi zorê û cudatîdanîna sîstematîk, mînakên rohn ên berçav û sîstematîk ên mafên mirovî û xalên medenî têne hisêb. Ev kiryar serhev nîşanderê bûna mînakek diyarîkirî ji siaysetên ewlehî-serbazî li hember gelan û deverên piştguhavêtî yên Îranê ye.
Kiryarên spaha pasdaran bi navxweyê îranê sînordar nemaye û vê damezraweyê bi riya spaha quds û piştevanîkirin, rêkxistin û teyarkirina girûpên çekdar ên milîs li tevdanî çêkirina li deverê û binpêkirina eşkere ya mafên mirovî li welatên din de rol hebûye. Terorkirina dijberên siyasî yên rêjîma Îranê li derveyî Îranê, welat û li axa Ewropayê, mînakên herî eşkere ji nasnameya derveyîsînûrna e, mijarek ku li biryardanên dadwerî yên xwedî hitbar ên wek biryardana dadgeha Alman li dosyeya Mîkonosê, pêka belgeyan hatiye piştrastkirin.
Kongireya Neterwên Îrana Federal li ser vê baweriyê ye ku biryara Yekîtiya Ewropayê, bo karlêkeriya tevav, dibe bi kiryarên tevaker re be, wek lipeyketina dadwerî a fermander û bikerên wan cinayetan, tomarkirina dorpêçên armancdar û li praktîkê de dawîanîn bi parastîbûna kesên ku di binpêkerên micid ên mafên mirovî û kiryarên terorîstî de rol hebûne.
Em tekez dikim ku bidestveanîna aşitiyek hertimî, cihgîrbûn û jiyaneke bi hevre ya aşitîxwazane li Îranê, hewcehî bi derbasbûn ji sîstema tepeserker, garantîkirina mafên vekhev a hemû welatiyan, bi fermînaskirina mafên netewan û cihgîrkirina sîstemek Dêmoikratîk û Federal li ser bingeha desthilata yasa û îradeya azad a hemû xelkê welat be.
Kongireya Netewên Îrana Federal daxwaz ji Yekîtiya Ewropa û civaka cîhanî dike ku li çarçoveya sozên navnetewiyên xwe, li kêlega xelkê Îranê bi taybet gelên li jêr cudatîdanînan de bisekine û derfetê nede ku binpêkirinên micid û rêkxistinkirî yên mafên mirovî û kiryarên terorîstî bê bersiv û dadperweriyê bimînin.

**Kongireya Netewên Îrana Federal**
**30ê Kanûna duyem a 2026 an**

## Nerîna



**“Mistefa Hicrî”:**

**“Ti pirsgirêkên me yên şexsî bi kesî re nînin. Em behsa “sîstemê” dikin. Kurdistanê ji bo azadiyê bedelên giran daye û em naxwazin ji dîktatoriyekê derbasî dîktatoriyek din bibin. Ji bo me girîng e ku di Îrana pêşerojê de pirrengî û mafên neteweyan neyên paşguhkirin.e”**



**“Mesûd Barzanî”:**

**“Xelkê Welatparêz ê Kurdistanê careke din ew rastî ji hemû cîhanê re ducare kir ku gelê Kurdistanê di xweşî û nexweşiyê de hevpar û hevxem û pişt û penaya hev e.”**



**“Feysel Yûsif”:**

**“divê Kurd di Sûriyeya paşerojê de bibin şirîkên sereke” û mafên wan di destûrê de werin parastin.”**



**“Tuncer Bakirhan” :**

**“Kurd li dijî tunehesibandina li ser maseyê derdikevin”**

# Kurd ji bo Kurdistanê şer dikin, ne ji bo Tehranê



**N. Eskender Ceiferî**




Kurdistan, axek ku bi sedan salan di bin kolonyalîzma navxweyî ya Îranê de hatiye pelçiqandin, îro ji her demê bêtir ji bo serxwebûnê diqîre. Kurd ne Şah û ne jî Mela dixwazin; ew dêmokrasiyeke rastîn dixwazin, dêmokrasiyek ku tê de nasname, ziman û çarenûsa wan êdî di destê Tehranê de nebe.

Ev têkoşîn ne ji bo “rizgarkirina Îranê” ye, belku ji bo rizgarkirina Kurdistanê ji destê kolonyalîzma Farsî ye. Rojhilatê Kurdistanê, bi çavkaniyên xwe yên xwezayî yên dewlemend ên wekî petrol, gaz, kangeh û av, her gav wekî koloniyeke navxweyî hatiye dîtin, ku dewlemendiya wê ji bo navenda Îranê tê veguhestin û xelkê Kurdistanê bixwe di rewşeke nebaş û bêpariyê de tê hiştin.

Dîroka Kurdan şahidiya vê rastiyê ye: ji rojên destpêkê yên rêjîma Pehlewî ve, Kurdan li dijî dîktatoriya kolonyalîst û faşîst a Şah şer kirin. Komara Kurdistanê ya di sala 1946an de, yekemîn komara dêmokratîk di dîroka nûjen de, sembola vê berxwedanê bû.

Komar di 22ê Çileya 1946an de bi beşdarbûna zêdetirî 20,000 kesan li bajarê Mahabadê û bi serokatiya Pêşewa Qazî Mihemed hate damezrandin û 11 heyvan dom kir.

Di vê heyama kurt de, zimanê Kurdî bû fermî, dibistanên Kurdî hatin damezrandin û ji bo serxwebûna çandî û siyasî hewl hatin dayîn. Lê di Kanûna 1946an de, artêşa Îranê bi tank û hêzên leşkerî ket Mehabadê û komar hilweşand. Pişt re Qazî Mihemed û hevalên wî hatin darvekirin û ev ezmûna dîrokî bi dawî hat. Piştî şoreşa 1979an, Kurdan ji xelkên din zûtir fêm kirin ku Xumeynîzm vêrjêneke nû ya heman kolonyalîzmê ye, kolonyalîzmek olî ye ku li şûna tacê şaşik daye serê xwe.

Ji serhildana 1979an, ku Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê û Komale roleke sereke lîstin, heya niha, bi hezaran Kurdan di doza azadiyê de jiyana xwe ji dest dane, ne ji bo “parastina yekparçeyiya axa Îranê”, belku ji bo parastina yekparçeyiya hebûna xwe. Ev serhildan bi tepeserkirina xwînî re rû bi rû man û bi hezaran kes hatin darvekirin, girtin an jî koçberkirin.

Kurd her tim li kêlega gelên din ên bindest sekinîne. Di serdema Şah de, wan piştgirî da Erebên Ehwazê û Tirkên Azerbaycanê. Di dema rêjîma Xumeynî de, di xwepêşandanên seranserî yên salên 1996, 1998 û yên Jin Jiyan Azadî û heya niha, xwîna wan bi xwîna Belûç, Ereb û Tirkmenên ku li dijî dîktatoriya zordar a dagirkar derdikevin, hev digire û şerê dagirkar dikin. Lê ev hevgirtin nayê wê wateyê ku meriv xwe radestî projeya “Îraneke yekgirtî” kiribe. Kurd dizanin ku azadiya rastîn tenê di çarçoveya xweserî an serxwebûnê de çê dibe, ne di çarçoveya welatekî de ku wan wekî “beşek ji neteweya Îranê” bi nav dike û di pratîkê de wan kolonîze dike.

Polîtîkayên bicihkirina Farsan li Kurdistanê, qedexekirina perwerdehiya bi zimanê Kurdî û tepeserkirina çandî ya sîstmatîk hemî nîşaneyên vê kolonîzasyona navxweyî ne.Ramanwerê mezin ê dijî-kolonyalîzmê bi navê Franz Fanon di pirtûka xwe ya The Despossed Lands de gotiye: “Kolonyalîzm tenê bi tundûtûjiyê tê damezrandin, û ew tenê bi tundûtûjiyê dikare were hilweşandin.” Ew tekez dike ku neteweyên bindest nikarin li benda “reforman” ji kolonyalîst bin, divê ew xwe ji nû ve ava bikin û avahiyên zordar ji kokê ve hilînin.

**Fanon dibêje: “Divê her nifşek, erkên xwe xuya bike, wê bicîh bîne, an jî xiyanetê lê neke.” Ji bo Kurdan, erkê îro ew e ku kolonyalîzma navxweyî ya Îranê bi dawî bikin, kolonyalîzmek ku çavkaniyên Kurdistanê talan dike, zimanê wan qedexe dike û ciwanên wan dide ber guleyan.**

Hejmarên saziyên mafên mirovan nîşan didin ku her sal bi sedan welatiyên Kurd têne darvekirin, û di deh salên dawî de, bi sedan çalakvanên siyasî û çalakvanên sivîl ên Kurd hatine darvekirin. Ev darvekirin beşek ji stratêjiya tirs û tepeserkirinê ne ji bo parastina serdestiya dagirkar.

Têhran, hem di serdema Pehlewî de û hem jî di serdema Wilayeta Feqîh de, Kurdistanê ne wekî beşek bê cîyawazî ya Îranê, lê wekî koloniyek ji bo dabînkirina petrol, gaz, hêzên leşkerî û keda erzan dîtiye. Siyasetên bicihbûna Farsan, tepeserkirina çandî, darvekirinên bi kom û bêparbûna aborî hemî beşek ji heman projeya kolonyalîzma Îranî ne.

Kurdistan bi asta herî bilind a bêkarîyê re rû bi rû ye rewşa abûrî gelek xirabe û enfilansiyon gelek zêde ye, di heman demê de çavkaniyên Kurdistanê yên xwezayî ji bo Têhranê têne veguhestin û veberhênanên rastîn di pêşkeftina herêmî de nayên kirin.

Tenê Kurdistaneke azad dikare bibe modêlek ji bo dêmokrasî, wekheviya zayendî û jiyana aştiyane ya neteweyan, modêlek ku îro li Başûrê Kurdistanê pêk hatiye.

Başûr, bi pergala xwe ya dêmokratîk a li ser çar wîlayetên li Herêma Fêdêral a Kurdistanê, beşdariya wekhev a jinan, jiyana aştiyane di navbera Kurd, Ereb û Asûrî de, modêlek pêşeng li herêma Rojhilata Navîn e. Kurd êdî naxwazin xwîna wan ji bo parastina Têhranê were rijandin, ev ji bo Kurdistanê şer dikin, û dixwazin bigehne mafê xwe û xwe serwerê xwe bin.

Dema wê ye ku Kurdistan ji aliyê gelê Kurd xwe ve bête îdare kirin. Ev ne xewn e, lê pêdiviyek dîrokî ye. Wekî ku Fanon hişyarî da, neteweya bindest an dê azad bibe, an jî dê ji nav biçe.

Kurdan rêya yekem hilbijartiye û têkoşîna wan heya dema ku Kurdistanek azad û serbest pêk were, berdewam dike.

# Muradperest: Divê rêxistinên mafên mirovan li Îran û Rojhilatê Kurdistanê, ji cinayet û komkujiyên rejîma Îranê bi giştî û ji wan kesên ku li ser şeqaman şehîd bûne haydar be û divê hemû zaniyarî û amar û cinayetên rejîmê bên belgekirin û konferans û civînên navneteweyî ji bo wan zanyariyan werin organîzekirin û ev belge radestî rayedarên cîhanê bên kirin.



**Hevpeyvîn: Ezîz Muradperest**

**Hevpeyvînkar: Sîmîn Rûhanîzadeh**

**Di Hevpeyvîna vê carê a Rojnameya Agirî bi Ezîz Muradperest Çalakvanê Siyasî re, me basa giringiya kombûn û aksiyonên Kurdan li derveyî welat û pêngavên hewce bona giwaş xistine ser rejîma Îranî li civaka cîhanî kir.**

**Pirsyar - Cinatetên rejîma Îranê ku di meha Befranbara îsal li Îran û Rojhilatê Kurdistanê encam daye weke xwe kariye bigehîte civateka cîhanî û dinyaya derê?**

Bersiv - Ji bo bersiva wê pirsê, hevceye em alîyên wê pirsê bibînin û danên bal hev, hingê rengê bersiv zelaltir bihê dîtin

Xwepêşandanên vê carê ji hemû xwepêşandanên berê cuda bûn, ji ber ku xwepêşandanên li dijî rejîmê hemû parêzgehên Îranê girtin û bûyê Şoriş û serhildanek giştî û armanca sereke jî ya gelên azadîxwaze îranê hilweşandina rejîmê bû.

Ji ber vê yekê, rayedarên rêjîmê û li serîda şexsê Xamineyî matmay man û lewma dibîya li navbera helatin û vaz înan ji deselatê û hilweşana rêjîma wan û yan jî qirkirna xelkê ser şeqaman, yêkê helbijêrin, mixabin evan ji boy qirkirin û komkujîya xelkê ferman dane hêzên leşkerî û bixasma Sipaha Pasdaran, evan jî îran kirne zîndanek mezin û derî û pencere ser xelkê qifil dan û hemû pêywendîyên xelkê ji bo dervey îranê, yanî rêyên erd û esmani ji xelkê girtin ji bo ku bi hêsanî bikarin çi bixwazin dûr ji çavên ragehandinê encam bidin, hevcey gotinêye ku ev jî kirin, cinayetên rejîmê ji alîyekê û li alîyê din jî ev pêşangehên armancdare rêjîmê ji termên kuştîyan dinav kîsên reş da û wergirtina pare li hember radestkirina termê kuştîyan li malbatên wan, nekarî wan cinayet û komkujiya rejîmê li çavên cîhanê weşêrin.

Bi belav bûna wan vîdeo û dîmenên tawankariyê yên Sipaha pasdaran, êdî kesê nekarî li hember wan komkujîyan bê helwêst be, her li wê pêwendiyê de hevcey gotinê ye ku Kaya Kalas, berpirsa siyaseta derve ya Yekîtiya Ewropayê got “Zilm nikare bê bersiv bimîne û lewma niha Wezîrên Dereve yên Yekîtiya Ewropa gaveke girîng avêtine û Sipaha Pasdaran wekî rêxistineke terorîstî binav kirine.”

Wê got: “Heçî rêjîmek ku bi hezaran mirovan bikuje, ji bo tunekirina xwe dixebite.”

Bes niha em digehine wê encamê ku bersiv belêye û tevî hemû weşartinekê ku rêjîmê ji bo cinayetên xwe diket, lê niha Sipaha pasdaran ku hemû biryara li îranê di destê wan dan de ye, niha li nav lîsta rêkxiravên terorîstî de ye.

**Xwenîşandana û akisiyona kurdan li welatên Ewropayî heta niha kariye destkewtek baş bona gehandona dengê gelê Kurd li Rojhelat û Rojavayê Kurdistanê hebe?**

Mixabin ne! çimku berî her tiştî hewce ye ev karê ku em dikin û yê bikin armanca me ron be ku em çima û ji bo çi wî karî dikin.

Mixabin ew xwenîşandan û akisiyonên me kurdan li dîyaspora heta niha nekarîne dengê gelê me li Rojhelat û Rojavayê Kurdistanê bi başî bigehîne guhê civatgeha cîhanî.

Ji ber ku piraniya çalakiyên me di rojên Şemî û Yekşemiyê de ne, ku dawiya heftiyê ye û hemû cihên biryardanê girtî ne. Em sloganan didin û piraniya sloganên me bi zimanê Kurdî ne ku ji bilî me kesek din jê fêm nake. Divê xwepêşandan di rojên asayî yên hefteyê de li ber parlementoyê an jî nêzîkî cihên girîng ên welat û heta li ber balyozxaneyê û cihên têkildar were lidarxistin. Divê daxwazên xwepêşanderan bi xal werin destnîşankirin û ji aliyê şandeya xwepêşanderan ve radestî aliyê diyarkirî werin kirin û bersiv bê wergirtin. Bê guman, me berê bi wî rengî xwepêşandan dikir, Lê niha ev ne wisa ye û armanca organîzatorên van mîtîngan ew e ku gel hestên xwe derbibirin.

Divê ez vê jî bibêjim ku carinan endamên parlementoyê û nûnerên partiyên van welatan ji bo axaftin û peyaman tevlî me dibin, lê ew jî di dawiya hefteyê de ne û tiştî li gorî ku ji dûr ve tê hêvîkirin naçin pêş.

Ji ber vê yekê, ez bawer im ku bi xwepêşandanên wê dawîye ji bo piştgiriya Rojhilat û Rojavayê Kurdistanê, bi hemû wan çalakiyan me nekariye bandorê li ser dezgehên biryardanê û xelkê van welatan bikin da ku piştgiriyê bidin Rojava û Rojhilatê Kurdistanê.

**Yekgirtina Kurdan yên her çar aliyên Kurdistanê di nava wan xwenîşandan û rêpêwînên welatên Ewropî de di niha de dikare çi peyamek hebe?**

Bê guman, heta ku em yekgirtî bin, hem dost û hem jî dijmin dê li ser me hesab bikin. Yekîtiya me çeka herî girîng e ji bo pêşîgirtina li hemû kompleyên dijminan. Ji aliyê din ve, dostên me dê kêfxweş bibin û dê amade bin ku zêdetir û baştir alîkariya me bikin. Ev yekîtiya gelê me, ya wê carê hem li hundir û hem jî li derveyî welat, bê mînak bû, Eşkere ye ku gelê me hem li hundir û hem jî li derveyî welêt, bêyî ku cudahîyên xwe yên siyasî, olî û herêmî li ber çavan bigirin, biryar daye ku yekgirtina xwe biparêze, ji ber ku ew dizanin ku dijmin bê cudahî li dijî miletê me ye. Lê divê ez vê jî bibêjim ku mixabin di nav hêzên me yên siyasî de yekîtiyek wisa tune ye. Hin hêzên siyasî yên Kurd hene ku pêşwext dipirsin û dibêjin ger di wê çalakiyê de sirûda Ey Reqîb were xwendin, em beşdar nabin. Hin hêzên siyasî yên Kurd yên din jî hene ku pêşda dipirsin ku eger ala Kurdistanê di çalakiyê de were bilindkirin, em beşdar nabin.

Yanî, ew yekîtiya ku di nav gel de heye mixabin di nav hêzên siyasî de nîne.

**Bi nêrîna te heta niha Kurdan kariye pirsa Kurd li derweyî welat bike pirsek Kurdistanî û ji çarçêweya hizbî derêxe? Ger na divê çi pêngavek bê hilgirtin bo vê yekê?**

Ne mixabin, hêşta kurdan nekarîye pirsgirêka Kurd bikin pirsgirêkek kurdistanî û bibin nava civînên navneteweyî. Mixabin, hîn jî navendeke biryardanê ya yekgirtî ya Kurdî tune ye ku pirsa Kurdî li derveyî welêt temsîl bike û hêşta têkilî bi navendên navneteweyî û welatên biyanî re bi rêya partiyên Kurdî ne. Di vî warî de, mixabin kêm partîyên Kurdî hene ku bi awayekî neteweyî difikirin û armanca wan çareserkirina pirsa neteweyî ye.

Ji ber ku partiyên siyasî yên Kurd bêtir çep û rast in, ku her yek ji wan bi îdeolojiyekê ve girêdayî ne heta bi mesela neteweyî.

Her çend xwepêşandanên li derveyî welêt pir pêwîst û girîng bin jî, lê ev têrê nake û Kurdistaniyên dervey welêt hewce ye ku pirsgirêka Kurd wekî neteweyek bi dehan milyonan mirovên bê maf bînin forumên navneteweyî û di vê mijarê de, divê li navendên girîng ên cîhanê were gotin ku Kurd hîn jî ji maf û azadiyên herî bingehîn ên Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovan bêpar in.

**Kurd û navendên mafê mirovî divê çi bikin ku ev cinayetên rejîmê tenê weke amarek nemînin, û berteka civaka cîhanî jî tenê daxuyanî nebe, belku bibin giwaşek siyasî bo ser rêjîma Îranê?**

Divê her Kurdek, bi taybetî rêxistinên mafên mirovan li Îran û Rojhilatê Kurdistanê, ji cinayet û komkujiyên rêjîma axundiy bi giştî û ji wan kesên ku li ser şeqaman şehîd bûne, an di girtîgehan de hatine kuştin, an jî hatine girtin û çarenûsa wan nediyar e haydar be. Di wî warî de, divê hemû zaniyarî û amar û cinayetên rêjîmê werin belgekirin û konferans û civînên navneteweyî ji bo wan zanyariyan werin organîzekirin û ev belge radestî rayedarên cîhanê werin kirin.

Divê ji rayedarên cîhanê were xwestin ku helwesteke guncaw nîşan bidin da ku li hember kiryarên rêjîmê bertek nîşan dan û bilî balyoz û berpirsên rêjîmê li ser asta wan welatan werin derxistin. Ewa ku Yekîtiya Ewropayê sipaha pasdaran xist nav lîsteya rêxistinên terorîstî de, tiştekî gelek baş bû. Rêjîm di hemû waran de ji aliyê civaka navneteweyî û rêxistinên mafên mirovan ve rastî giwaşan hatiye û di bin dorpêçeke aborî de ye ku di dîroka welatan de bêhempa ye.

Lêbelê, hîn jî hewcehî bi hevkariya gişt aliyan heye ji bo hilweşandina vê rêjîmê ku sûc û zordariya li ser gelên Îranê ji aliyê komek melayên paşvero û dijî mirovî ve dawî pêbêt.

**Spas bo birêz Ezîz Muradperest**

**Gelek sipas û hevîya serkevtinê ji bo kar û xebata we**

# “Ew zarok in, ne şervan in! Zarokên Kurdistanê di bin siya desthilatdariyê de“



N. Sefiye xalidî

Şer her tim herî zêde bandorê li ser zarokan dike. Mezin bi kêmanî peyv û têgehên pêwîst hene ku tundûtûjî, tirs û windakirinê fam bikin, lê zarok li hember van serpêhatiyan bêparastin in. Şer ne tenê ewlehiya wan, belku di heman demê de zaroktiya wan jî ji wan distîne.

Li Kurdistanê, zarok di şert û mercên ku divê tu zarokek tê de nebe, mezin dibin. Şerê siyasî yê berdewam, tepeserkirina welat û şîdeta leşkerî rastiyek derxistiye holê ku tê de tewra yên herî biçûk jî neçar in ku berpirsiyariyên ku ji temenê xwe pir wêdetir in hilgirin. Zarok derdikevin kolanan, xwepêşandanan dikin, beşdarî xwepêşandanan dibin û bi berdewamî di nav agirê têkoşînên desthilatdariya siyasî de asê dimînin.

Ewa ku zarokên li Kurdistanê neçar in mîna mezinan xwepêşandanan bikin, ne nîşana gihîştina siyasî ye, ew îfadeya têkçûna kolektîfê ye. Dema ku zarok li kolanan dengê xwe bilind dikin, ne ji ber ku ew têne parastin, belku ji ber ku mafên wan bi awayekî sîstematîk têne paşguh xistin. Ew ne ji bo îdeolojiyan şer dikin, ew ji bo man, ji bo rûmetê û ji bo pêşerojeke geş, şer dikin.

Baweriya ku zarokên Kurd divê ji zarokatiyê ve ji bo gel û axa xwe rabin, di dîroka zilmê de kok digire. Bi sedsalan e, Kurd rastî şîdeta dewletê, qedexeyên li ser ziman, çand û nasnameya xwe, û înkara sîstematîk a naskirina siyasî hatine. Ji bo gelek dewletên bihêz, Kurdistan ne wekî dewletek û ne jî wekî rastiyek siyasî ya wekhev e.

Ji ber vê yekê xelkê Kurdistanê tirsa wê heye ku were tunekirin an jî neyê dîtin. Di vê çarçoveyê de, zarok ne tenê wekî takekes, belku di heman demê de wekî hilgirên pêşerojê, wekî hêviya dawî ya azadiyê jî têne dîtin. Nifşê nû tê wateya ku tiştê ku ji nifşê berê hatiye girtin bidomîne.

Ji ber vê yekê Kurd hewil didin ku Zarok zû fêr bibin ka ew ji bo çi şer dikin: ziman, nasname, rûmet û xwerêvebirin.

Xwenîşandan, sembola siyasî dibin cihên ku ev nasname lê tê xuya kirin, her wisa bi riya zarokan jî, Li pişt vê yekê ji tirsa jibîrkirinê kêmtir bêxemiya li hember başiya zarokan heye. Ger zarok jî bêdeng bimînin, tirs ew e ku doza Kurd dê her û her were tunekirin.


Lê ev helwest di heman demê de encamek trajîk a zordariyê bi xwe ye. Dema ku gelek neçar dimîne ku zarokên xwe ji hêla siyasî ve seferber bikin, ev nîşan dide ku çiqas parastin û cîh ji bo wan kêm dimîne. Zarok ne ji ber ku ew ji bo wan têra xwe bihêz in, belku ji ber ku mezin rêyek din nabînin ku werin bihîstin!

Pirsgirêk bingehîn e: zarok barê pevçûnek ku wan çênekiriye hildigirin. Fikra ku „divê ew azadiyê di dilê xwe de hilgirin“ ji perspektîfek dîrokî ve têgihîştî ye, belku ew xeterek mezin dihewîne. Ew parastinê bi hêviyê û zaroktiyê bi erkê diguhezîne. Welatparêzî dibe stratejiyek jiyanê, ne hilbijartinek azad.

Gelekî ku bi sedsalan e bindest bûye, bi awayekî têgihîştî formên radîkal ên xwe-îspatkirinê pêş dixin. Lê azadiya rastîn li wir dest pê dike ku zarok êdî neçar nînin ku îspat bikin ku ew aîdê wan in. Pêşeroja Kurdistanê nikare li ser zarokên ku zaroktiya xwe feda dikin, belku li ser wê yekê ku di dawiyê de destûr tê dayîn ku wê bijîn were avakirin.

Pêşketineke rastîn a siyasî wê demê were bidestxistin ku zarokên Kurd êdî neçar nebin li ser dikan an kolanan rawestin da ku hebûna gelê xwe rewa bikin û karibin bi ewlehî mezin bibin. Û dibe ku mezin berpirsiyariya têkoşîna siyasî bêxin ser milê xwe, ne ku ser milê Zarokan.

Ew hêviya ku zarok ji temenê biçûk ve hebûneke giştî nîşan bidin û parêzvaniya gel û welatê xwe bikin, ne bêtir nîşaneya îdeolojiya îndoktrînasyonê ye, belku bêtir bertekek li hember tirsa windabûna çandî û siyasî ye. Xuyabûna siyasî – di nav de ya zarokan jî – ji bo misogerkirina domandina nasnameya Kurdî wekî pêwîst tê dîtin.



Encamên piskolojîk giran in. Gelek zarokên Kurd di nav tirseke berdewam de mezin dibin: ji girtin, ji tundûtûjiyê, ji windakirina malbatên xwe. Trawma nayê dermankirin ji ber ku piştgiriya piskososyal kêm e an jî ji hêla siyasî ve nayê xwestin. Tirs, hêrs û bêhêvîbûn nifşek diyar dikin ku aramî û ewlehî ji wan hatiye bêparkirin. Şer di hişê zarokan de bi dawî nabe – ew li wir berdewam dike, pir caran ji bo tevahiya jiyanê.

Zarok di heman demê de ji hêla fîzîkî ve jî bêparastin in. Di dema xwepêşandanan de, ew rastî gaza rondikrêj, guleyên şer û tundûtûjiyê tên. Birîndar pir caran nayên dermankirin ji ber ku alîkariya bijîşkî peyda nabe an jî, ji tirsa tolhildanê nayê dûrxistin. Peymanên navneteweyî ji bo parastina zarokan di şer de hene, lê ew li Kurdistanê têne binpêkirin.

Dewletên ku dibêjin ew mafên mirovan diparêzin, çavên xwe ji aliyekî ve digirin. Saziyên navneteweyî bi dudilî an jî qet bertek nîşan nadin. Bêdengiya civaka navneteweyî bi awayekî nerasterast tundûtûjiyê rewa dike û nîşan dide ku êşa zarokên Kurd ji hêla siyasî ve tê nîqaşkirin.

Heya ku zarokên Kurd neçar bimînin ku li kolanan xwepêşandanan li dar bixin, ne ku di ewlehiyê de mezin bibin, tiştek eşkere ye ku“ şer ne tenê li dijî herêmek an gelekî ye, lê li dijî pêşerojê bi xwe ye“.

**Aştiyeke siyasî ku zarokan neparêze, qet aştî nîne.**

Parastina zarokan li deverên şer, cudahiyek zelal di navbera çalakvaniya siyasî û avakirina nasnameya guncaw a temenî de hewce dike. Ziman, dîrok û nirxên çandî dikarin li derveyî xwepêşandanên giştî jî werin veguhestin, bo nimûne, bi rêya malbatan, destpêşxeriyên perwerdehiyê, dibistanên nefermî, wêje, muzîk û kevneşopiyên devkî. Ev rêbaz bêyî ku zarokan bi şîdeta fîzîkî an psîkolojîk re rûbirû bikin, aîdiyet û baweriya bi xwe xurt dikin.

Zarokek ku neçar ma şer bike an xwepêşandanan bike, jixwe winda kiriye. Ne ji ber qelsiyê, belku ji ber ku cîhanê ew ne parastine!

Cihê zarokan ne li kolanên xwepêşandanê ye, û bê guman ne li tu deverek nêzîkî tundûtûjiyê ye. Cihê wan li dibistanan, li malbatan, di ewlehiyê de ye. Aştî ji bo wan ne armancek siyasî ye , belkî ji bo jiyanê pêdivîyek e.

Zarokên me pêşeroja me ne, ne mertalê me ne!

Ew Kurdistanê di dilê xwe de hildigirin, bêyî ku li kolanan bin û qîrîn bikin!

Erka me ew e ku em wan biparêzin, bihêlin ku ew tendurist mezin bibin û ziman, nasname , welat, çand û hebûna wan bi ewlehî bigihînin wan, da ku ew sibê/ li pêşerojê bihêz bin, ne ku îro birîndar bibin.!

# Şivan Perwer, Dengê ku dîrok şiyar kir
# Bi boneya pêncî saliya çirûskîna li asîmanê hunera Kurdistanê



N. Mecîd Heqî

**Beşa 4 û dawî**

Di stranên din de jî heman mantiq dubare dibe: cîhana dewletan, komaran û siyasetan, cîhaneke bêîstîqrar û bazarî tê teswîrkirin; cihê ku mafên mirovan li ser navê berjewendiyên aborî û jeopolîtîk têne qurbankirin û milet di bazara berjewendiyan de têne firotin. Şiwan vê rastiyê ne bi zimanê manîfesto û dirûşmeyan, lê bi vegotina êşa xelkê asayî tîne ziman—zarok, kal û pîr, girtî û sirgûniyan. Ew “jiyana rojane” li hemberî îdeolojiyên mezin datîne û her ji vir e ku dengê wî dibe wijdan, ne dibe hizib.

Di heman demê de, ev nêzîkatiya serhizbî derfet da Şiwan ku muzîka Kurdî ji sînorê “folklora herêmî”—ku bi piranî guhdarê nav-qewmî hebû—ber bi asta “Muzîka Cîhanî” (World Music) ve bilind bike. Hevkariyên wî yên bi hunermendên navneteweyî û konsêrtên wî yên xêrxwaziyê re, ji wan pêşandanên bi beşdariya kesayetên wek Luciano Pavarotti, wêneyekî din ji Kurdan pêşkêşî cîhanê kir: rûyekî çandî, aştiyane û mirovî; cûda ji wê wêneyê ku medya bi piranî ji şer û tundiyê nîşan dida.

Digel vê yekê, Şiwan siyaset înkar nekir; belkî ew bir asteke kûrtir. Di bangewaziyên xwe yên dubare bo pêkvejiyan, wekhevî û rûmeta mirovî de—bêyî cudahiya ziman, çand, ol û alayê—huner bi zimanê exlaqê cîhanî diaxive. Cihê ku zilm li mirov, bêyî liberçavgirtina nasnameyê, mehkûm e û “mirovbûn” berî her sînorbendiyeke siyasî tê. Li vir e ku muzîka wî ji sînorên qewmî derbas dibe û dibe zimanê dadmendiyê.

Vegera Şiwan Perwer a Bakurê Kurdistanê di sala 2013an de, bi hemû bertekên dijber re—ji pêşwaziya alîgirên diyalogê bigire heya rexneya kesên ku ew wek lihevkirina bi desthilatê re dîtin—nîşan da ku tewra dûrketina ji “rêbertiya siyasî” jî azadbûna ji qada giştî garantî nake. Şiwan , çi bixwaze çi nexwaze, di nav gerdûna neteweyeke siyazebûyî de amade ye; lê cûdahî di vê yekê de ye ku ew vê amadebûnê ne bi ala hizbê, lê bi ala çandê wate dike.

Di dawiyê de, Şiwan Perwer lehengê kêliyên hilbijartinê ye: hilbijartina hunerê li şûna fermanê, deng li şûna çekê, û bîr li şûna jibîrkirinê. Wî siyaset red nekir; ew ji inhisara desthilatê derxist û li qada gel vegerand—li wir ku stranek dikare hem nerazîbûn be, hem derman be, û hem jî bîranîneke sade lê bingehîn be: Berî her tiştî, em mirov in.

**Perdeya Heştemîn: Dengê ku Nayê Bêdengkirin**

Werin em dîsa vegerin heman gundê sar ê li Cizîra Botan.

Kurikek li pişta xaniyekî axîn, bi darikekî tenik, li kevir dixe. Belkî wê rojê, kesî xeyal nedikir ku ev lêxistin dê rojekê li salonên ronî yên Ewropayê, li stadyûmên Kurdistanê, li festîvalên cîhanî û di telefonên mobîl ên nifşên paşerojê de bên dubarekirin. Ew lêxistin sade bûn, xav bûn, lê tiştekî kûrtir di xwe de hildigirtin: Rîtmeke ku ji kûrahiya bêdengiyê dihat.

Di odeyeke din de, li heman erdnîgariyê, giyanê Ehmedê Xanî hîn jî di nav refên kevin û destxetên Mem û Zînê de digere; cihê ku helbest, beriya ku dewlet ji dayik bibe, behsa “milet” kir. Û li quncikekî Qahîreyê, çapxaneyeke bêdeng, bîranîna wê rojê diparêze ku hejmara yekem a rojnameya Kurdistanê ji makîneyên çapê derket û peyva “Kurdistan”ê ji bo cara yekem, reş li ser spîtiya kaxezê rûnişt.

Bi sedsalan navber di navbera van sê wêneyan de heye:

Helbestvanê arif ê sedsala heftdehan,

Rojnamegerê sirgûnkirî yê sedsala nozdehan, û stranbêjê sirgûnkirî yê sedsala bîstan.

Lê eger em bi hûrî guhdarî bikin, di bin qatên dîrokê de, rîtmeke hevpar tê bihîstin; heman rîtma ku kurikê gundî bi darik li kevir dixist: Rîtma şiyarbûnê.

Di sala 2013an de, piştî sî û heft salên sirgûniyê, Şiwan Perwer vegeriya Diyarbekirê; vegera ku ji sefarekê zêdetir, dişibiya vegera “deng” bo malê. Bi deh hezaran kes çûne pêşwaziya wî; hêsir, dirûşm, destên bilindbûyî û nêrînên ku wekî bixwazin salên qedexeyê bi carekê ve vegerînin. Hebûna kesayetên çandî û siyasî—û ew kêliya sembolîk a rûniştina li gel Îbrahîm Tatlises—nîşan dida ku ev bûyer tenê çalakiyeke hunerî nîne; giraniyeke wê ya dîrokî heye. Herçendî veger bi darizandinên dijber re rû bi rû ma be jî, lê di cewhera xwe de, nîşaneke zelal a serkeftina berxwedana çandî bû: Stranbêjekî ku demekê qedexe bû, niha ne bi çekan, lê belê bi stranan vedigeriya.



Ji bo fêmkirina “mîrasa” Şiwan , divê mirov wî ji çarçoveya stêrkeke muzîkê derxe û li kêleka du stûnên din ên şiyarbûna Kurdî deyne. Ehmedê Xanî şiyarbûn bi pênûsê dest pê kir; bi zanebûn bi Kurdî nivîsand da ku ziman ji perawêzê derxe û veguherîne hilgirê zanîn û siyasetê. Mem û Zîn ji bo wî tenê çîrokeke evînê nebû, belkî qîrînek li dijî dubendî û bêdewletiyê û bangawaziyek ji bo hişmendiya neteweyî bû—teksteke ku paşê, ji xelweta îrfanê derket û bû destaneke neteweyî.

Nifşê paşê, li şûna ku tenê ziman ava bike, hizra medyayê kir. Mîqdad Mîdhet Bedirxan di sala 1898an de rojnameya Kurdistanê di sirgûnê de weşand; rojnameyeke koçber ku nusxeyên wê bi qaçaxî derbasî nava Împaratoriya Osmanî dibûn. “Kurdistan”ê tenê nûçe nedidan; ziman sîyasî dikir, bîr û hafize ava dikir û fêrî xelkê kir ku nasname dikare were çapkirin, were zêdekirin û dest bi dest bigere—heta heger di binê abayê de be an li pişta deriyên girtî be.

Û piştre dor hate Şiwan Perwer; kesê ku heman proje bi medyayeke hêsantir domand. Wî teoriya Xanî û rêbaza Bedirxan ji kaxez û çapxaneyê gihande “guh”; cihê ku xwendewarî ne şert bû û bihîstin bes bû. Şiwan , zimanê Kurdî veguherand zimanê deng; dengekî ku sînor şikandin, diyaspora bi hev ve girê da û ji nava qedexeyê, hebûn afirand. Eger Xanî “Pirtûka Yekîtiyê” nivîsand û Bedirxan “Medyaya Yekîtiyê” çêkir, Şiwan “Strana Yekîtiyê” afirand—straneke ku dihat zimzimandin, bi hev re dihat gotin û radestî nifşê din dihat kirin.

Di vê sêkoşeyê de, xeteke sabit tê dîtin: Ziman, wekî hilgirê hişmendiyê. Xanî ziman bilind kir, Bedirxan ew xiste qada giştî û Şiwan ew di bedena kolektîf de bi cih kir; di qirrikan de, salonan de, civatên malbatî û kêliyên tirsê de. Her serdemekê, medyaya xwe ya qedexe hebû: Rojnameya Kurdistanê bi qaçaxî dihat belavkirin; bi dehan sal şûnda, kaset û bandên Şiwan bi dizî dihatin guhdarîkirin. Her nusxeyeke rojnameyê, her bandeke manyetîk, daxuyaniyek bû li dijî jibîrkirinê.

Ji nava vê tecrûbeyê ye ku Şiwan nêzîkî efsaneyê dibe. Her wekî çawa Mem û Zîn di hişê komî de bû destaneke neteweyî, hinek berhemên muzîkê jî di guhê komî de ciyê “sirûdê” girtin; firaqên dagirtî ji bo wateyê, ji bo sekinandinê, ji bo bûyîna “me”. Muzîka Şiwan —bi taybetî di diyasporayê de—dibistaneke bêdîwar bû; nifşekî ku belkî perwerdeya fermî bi Kurdî nedîtibû, dîrok û nasname bi rêya stranê tecrûbe kir. Salona konseran, ji bo gelekan, bû pola nasnameyê; ne bi texte û pirtûkan, belkî bi hevdengiyê, hêsiran û bêdengiya komî.

Îro, Kurdistan guheriye. Medyayên Kurdî pir in; kanal, malper, zanîngeh û pol hatine avakirin û ziman ji berê zêdetir derfeta bêhndanê heye. Belkî kesek bifikire ku rola dîrokî ya Şiwan bi dawî bûye. Lê bes e ku ciwanek li Stenbol, Hewlêr an Berlînê pêla lêdana mobîla xwe bike, an ba li çiyayên Cizîrê bigere, û dengekî xişokî û bi hêz dîsa bipirse: “Em kî ne?”—wê gavê dem disekine û hafize dîsa kar dike.

Şiwan karek kir ku artêşan nekarîn bikin: Hafizeya mîletekî neqişand—ne li ser kevir, belkî li ser bandên manyetîk, li ser deng, li ser hestê. Ew kurikek bû ku bi darik li kevir dixist, lê ew lêxistin îro wekî lêdana dilê mîletekî tê bihîstin. Eger Ehmedê Xanî “aqilê” vê şiyarbûnê bû û Bedirxan “ziman” û “medya”ya wê bû, bêguman Şiwan Perwer qîrîna wê ye.

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Pizîşkên çavan, li derheq kor kirina çavên neraziyan daxuyaniyek belav kirin

Hejmarek ji pizîşk û pisporên çavan, bi belavkirina daxuyaniyekê tevî nîşandana nigeraniya xwe, li derheq zêdebûna rêjeya korbûna hertimî û derbên bê veger ên çavan li nav xwenîşanderan bi taybet ciwanan, huşdarî dan û tekez kirin ku ev birîn, li encama bikaranîna berfireh û xoserane ji çekên saçmeyî ye ku bi awayê rasterast serûçavên xelkê kirine armanc.




Pizîşkan tekezî kirine ku kor kirina mirovan, li her rewşe de alava kontrolkirinê nîne, belku mînaka rohn a îşkencekirin, binpêkirina kerameta mirovî û kiryarek tawankarane ye ku pêka ti yasa û pirensîpeke olî, yasayî û exlaqê pizîşkî, rêpêdayî nîne.

Hêzên hov ên rêjîmê bilî teqe kirin bi çavên xwenîşanderan, bi çekên saçmeyî li mewdaya gelek nêzîk ve teqe bi serê xwenîşanderan kirine ku bûye sedema cudabûna beşek ji serê wan ku li hinek girtevîdyoiyan de hatine dîtin.

## Encumena Girtiyên Siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê rapora heyva Kanûna Paşîn 2026 belav kir

Xweragirî: Ev rapor li ser welatiyên Kurd ên Rojhilatê Kurdistanê ku li xwenîşandanên heyva Befranbar û Rêbendana 1404 a Rojî de li Îran û Rojhilatê Kurdistanê de ye ku hatine girtin û kuştinê Pêka amarên Encumena Girtiyên Siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê hatine tomarkirin ku beşçeke zêde ji vê raporê ev e:

Pêka vê raporê , nasnameyên 219 welatiyên Kurd hatine eşkerekirin ku ji aliyê hêzên tepeserker ên spah pasdaran a terorîst ve li Rojhilatê Kurdistan û Îranê hatine kuştin, piraniya wan ji 4 parêzgehên Rojhilatê Kurdistanê ne.

## Saziya lêbihorîna Navnetewî ragihand ku canê binçavkiriyan li ber gefê de ye

Saziya Lêbihorîna navnetewî bi belavkirina raporekê huşdarî daye ku canê hezaran binçavkiriyên serhildana seranserî ku xweserane hatine binçavkirinê, li girtîgehên rêjîma Îranê de li jêr gefan de ye û herwisa li jêr metirsiya îşkence, reftara hovane, tundûtîjiya cinsî û dadgehên nedadperwerane de ne.



Herwisa vê saziyê daye zanîn ku egera vê heye ku kesên binçavkirî rastî sizayên giran ên girtîgehê an bidarvekirinê bên.

Pêka vê daxûyaniyê, hejmarek ji binçavkiriyan bi zorê hatine bêserûşûnkirin û piştî axaftinên serokê dezgeha dad a rêjîmê, nigeranî li derheq vê rewşê gelek zêdetir bûne, wî cinayetkarê rêjîmê ferman daye dadistan û dadwerên dadgehên rêjîmê ku dibe bi avayê bêrehmane û tund digel girtiyan reftarê bikin û berpirsên rêjîmê jî daxwaza bidarvekirina xwenîşanderan kirine.

Li vê raporê de îşare bi teqekirin û binçavkirina pizîşk, perestar û kadrên dermanî û herwisa êrîşkirina hovane a hêzên rêjîmê bo ser mal û cihên karê wan hatiye kirin.

# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (511)